

Konferansa "Zarokên Keviravêj" li Stockholmê pêk hat



Rewşa zarokên Kurda di zindananê Turkiyê û Kurdistanê de, di konferansa li Stockholmê ya "Zarokên keviravêj" de bû cihê niqaşê. Konferans ji aliyê Partiya Çep li Swêdê (Vänster Partiet) û bi alîkariya Kurdocide Watch-CHAK ê ve hate organîzekirin. Partiya Çep berî niha delegasyonêk şandibû Amedê û li wir rewşa zarokan ji nêz ve şopandibû û li ser pirsê raporek amadekiribû. Rapora wan di konferansê de hate pêşkêşkirin. Gelek kesên siyasetvan, pisporên pirsê û xelkê beşdarî kir.

Axaftina destpêkê, sekretera çapemeniyê ya Partiya Çep û berendama parlamentoyê Hediye Guzel kir. Guzelê bala beşdaran kişand ser rewşa malbatên girtî û polîtîka dewletê li ser pirsê. Paşê li ser amadekirina raporê agehdarî da û mafê axaftinê da parlamenter Jacop Johnson. Johnson bi giranî li ser rewşa polîtîk ya Turkiyê rawestiya û paşê jî bi giranî li ser guhertina qanûna terorê axifî. Johnson anî zimên ku, guhertinên pêk hatine pirsê zarokên girtî çareser nekiriye û ji bo çareseriyê guhertinên cidî pêwîst in.

Di beşa nîşandana wêneyên gera delegasyonê de, Hediye Guzel bi firehî li ser gerê agehdarî da û rewşa li Amedê bi wêneyan anî ser perda sipî.

Hevpeyvîna Cîgirê Serokê Giştî yê CHAK ê Gabar Çiyan bi parêzvana mafê mirovan, ewuqat û endama IHD ye Keziban Yilmaz re bêhtir li ser naveroka qanûnên hatine guhertin û kêmasiyê wan bû. Yilmazê anî zimên ku, hikumet bi guhertinê li 2006 an vegeriya ye û guhertinên bingehîn pêk nehatine. Hejmarek qanûnên hene li dijî peymanê zarokan ya navnetewî ne. Îro jî zarokên têne girtin û zîndanîkirin. Bi heman qanûnê beşek ji zarokan hatine berdan, lê hejmarek mezin ji zarokan di hepsan de ne.

Piştî doktorê zarokan û endamê CHAK ê Nemrud Buyukkaya axifî û li ser nexweşiyên zarokan di hepsan de zaniyariyên giring pêşkêş kir. Buyukkaya piştî serbestmayîna zarokan, pêwîstiya wan ya bi tedawiyê kir mijara xwe û xwest ku alîkariya pêwîst ji bo zarokan bê amadekirin û pêşkêşkirin. Peymana mafê zarokan û pêkanîna wê li Turkiyê de kêmasiyên

hene zarokan dihêşîne. Divê ev yek bê çareserkerin û Turkiyê di çarçoveya peymanê mafê zarokan de pirsê girtina zarokan çareser bike.

Şaredarê SUR ê Abdullah Demirbaş bi rêya têtê beşdarî konferansê bû. Kordînatore CHAK ê Azad Heyder li ser sihet, û daweya wî û rewşa zarokên azadbûyî de agehdarî xwest. Demirbaş anî zimên ku, tenduristiya wî hinekî baş bûye û daweya li dijî wî didome. Zarokên hatine berdan bi pirsgerêkên tenduristî têne beramberî hev û pêwîstiya wan bi tedawiye heye. Şaredariya SUR ê projayek xwe li ser pirsê heye û daxwaz kir alîkariya zarokan bêhtir bê kirin.

Di niqasha li ser pirsê zarokên di zindanan de û rewşa demokrasiyê li Turkiyê, kordînatore CHAK ê Seyidxan Anter, niwênerê Konseya Kurd Yusuf Sultanî û dewletnas Zelal Bal dîtînen xwe anîne zimên. Anter li ser xebat û kampanyayên CHAK ê agehdarî da û program û hedefên dezgehê yê pêşerojê ronî kir. Rewşa malbatên zarokên girtî nixand û giringiya guhertina qanûna zarokan kir mijara xwe. Sultanî neheqiya li dijî zarokên Kurda dibin mehkum kir û got ku ew ê hetanî dawiyê piştgiriye bidin kampanyayê azadiya zarokan di zindanan Turkiyê û Kurdistanê. Bal, qala gera xwe ya welat kir û şahidbûna xwe ya buyera girtina zarokan û êşa dêbavan anî holê.

Konferansa zarokên keviravêj ya yekem li Stockholmê pêk hat. Li gorî zaniyariya hate pêşkêşkirin, konferansa duwê di serê meha ku were dê li Uppsalayê pêk were.

Kurdocide Watch-CHAK

Navenda Dokumentasyonê ya CHAK ê & EuroKurd News